


## “Dûrûyî”

Mirovê ku ji bo xwe û hemû mexlûqên din ên li ser rûyê erdê metirsiyê dixwe, min îqna kir ku erd cihê herî xedar a jiyanê ye.Tu ajalek bi qasî mirovê ku bi rêbazên herî hovane yên tinekirina cureyên xwe re mijûl dibe û rêyên.......

dom»R:9






## Mencenîqa sernixûniya rêjîmê li jê dorpêçên tund de

Dorpêça nû ya Yekîtiya Ewropa li ser keştiyên Îranê , derfeteke din bo bizava hilweşandina rejîmê zêde dike.Yekîtiya Ewropayê, ji ber ku bikare di rêya zext û givaşê de li hember rejîma Îslamî ya Îranê seba bernameya navokî, rewşa nebaş a mafên mirovan û piştgiriyê ji taqimên terorîstî yên herêmê û ... bisekine, di salên borî de dorpêçên cuda bi ser rejîmê de sepandine ku yek ji wan dorpêçan li ser dezgehê keştiyên Îranê bûye û car din di rojên borî de hatiye nûjen kirin.


dom» R:5

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (482)20-11-2024Buha (1000) Tûmen*



## Xezelwer berdewam e

Pênc sal bi ser meha Xezelwera sala 1398an a Rojî re derbas dibe. nerizayetî xwenîşandan bi hêceta bilindbûna sê qat a nirxa benzînê ji aliyê rêjîma Îranê ve, bû sedema lêdana çexmaxa serhildanek seranserî li Rojhilatê Kurdistan û Îranê.Li roja 24ê Xezelwera sala 1398an piştî biriyara dewleta Hesen Rûhanî bona bilindkirina nirxa benzînê, bû sedema rabûna .........

dom» R:4

## Bandora wegera Tiramp li ser rêjîma Îranê




Li dema pirûpagenda berî hilbijartina serkomarê Amerîka kêç kevtibû kevlê deshilatdarên rêjîma Îranê û gorî raporên dezgehên ewlehiyê ye Amerîka, rêjîma Îranê li rêka êrîşa saybêrî û danana tîmên taybet û pirûpagenda nerênî li mêdiayan de gelek cehd kir ku desttêverdanê bike û bandor li hilbijartina wî welatî de hebe bi dijî Tiramp û partiya Komarîxwaz.

Lê piştî hilbijartinê û xuyabûna encamê ku serkevtina Tiramp bû, deshilatdarên rêjîma Îranê zêdebarî evê ku gelek cehd dikirin ku tirs û nîgeraniya xwe weşêrin, radigehandin ku goy abo wan çi ferq nake ku kê li Amerîka de dibe serkoma û çi bandorek li ser siyaset û reftara rêjîma Îranê çinîne.

Ev jî di demekê de ye ku deshilatdarên rêjîmê berî ji nû ve hatina ser kare Tiramp hoşdarî didane hev, û Mihemed Cewadê Zerîf digot way li vê rojê ku hekî Tiramp wegere.

Bê guman bi berçavgirtina devra pêşda ya serkomariya Tiramp, egera gelek guhertinan têtê sehkirin, Tirampê ku devra pêşdaye deshilata xwe de tundtirîn dorpêç xistine ser rêjîma Îranê, Sipaha Pastaran weke girûpekî tirorîstî da nasandin û xiste nava lîstê reşe girûpên tirorîstî de, rêkevtinnama Bercamê dirand û li girûpa Bercamê derkevt, Qasim Silêmaniyê tirorîstê navnetewî yê fermandê sipaha Quds kuşt, ku vê care Tiram demekê de wegeriya ye ku digel rêjîma komara îslamî ya şiltaxtir, şerxwaztir, hirtir, nêzîktir bi çêkirina çeka Etomî, tepeserkartir li navxweya Îranê de û êrîşkertir bo ser Îsraîl wek nêzîktirîn hevalbendê Amerîka û xudî hêzên Amerîka li deverê de rûbirûye.

Lewra destê Tiramp bi wan sedeman wekirîtire ku reftarekî tundtir ji ya devra pêşde digel Îranê bike, bi taybetî ku niha base guhertina rewşê û base egera cîbicîbûna terhê Amerîka yê bi nave Rojhita Navîn a Mezin û terhê Îsraîl yê bi nave Rojhilata Navîn a Nû.

Hatina ji nû ve ye Tiramp, li rewşekî pir aloze Rojhilata Navîn û şer û tevdaniya ku sebebkarê serekeye wan şer û aloziyan jî rêjîma Îranê ye, herwisa rêjîma Îranê xwe kiriye aliyekî şerê di navbera Rûsiyê û Ukraynê û kevtiye nava Eniya dijî Amerîka û Ewropa, deshilatdarên rêjîmê bi aşkera wan rojan base egera çêkirina çeka Etomî dikin, Fermandên sipaha pastarana tirorîst gefa êrîşa 3 yê ya bi nave Sadiq bo ser Îsraîl dikin, vê berçavroniyê dide me ku Tiramp û Amerîka çi rêkekê bi dijî rêjîma Îranê dê bigirne ber xwe.

Îca hekî wisaye gelo tu bêjî, rêjîma komara îslamê cama jahiyê vexo û dev ji hemî wan şiltaxiyên xwe bikêşe û teslîmê Amerîka û Tiramp û Îsraîl û Civatgeha cîhanî dibe, yan dunaya û Amerîka û Tiramp û Îsraîl ji tires şiltaxî û şer û alozî û êrîşa rêjîma Îranê dê serê xwe bikêşne nava qalkê xwe û dê bê deng û bê helwêst bin?

Bêguman bersiv gelek zelale

## Mistefa Hicrî: Hewce ye ku xelkê Îranê bi xwe, xwe bihêz bikin û li benda ti aliyekê nebin ku bên û wan rizgar bikin



**Îşare:** Pêwajoya lezgîn a bûyeran li Rohilata Navîn de derî bo gelek eger û rewş û guherînên nû, vekiriye.

Karlêkereiya dijwartirbûna kirîzan li navbera Îran û civaka cîhanî, ew jî li jêr sîbera egera qewimîna şerê rasterast li navbera Komara Îslamî û Îsraîlê, dikare hem bibe gef û hem drfet û tevgera nerizayetiyên xelkê bi dijî komara Îslamê bê hisêb.

“Kurdistan” li hevpeyvînekê de digel rêzdar “Mistefa Hicrî”, berpirsê Navenda birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bas ji wan guherînan û bandorxistina bûyeran bi ser xebata mafxwazaneya gelên Îranê kiriye.

**Pirsyar** - Rêzdar Mistefa, hekî bi awirek giştî, tu yê rêzdar li ser rewşa siyasiya niha ya Îranê, ew jî bi balkêşandin bi ser kirîza siyasî û pêywendiyên Komara Îslamî digel cîvaka cîhanî, şirovekirina we li derheq rewşa siyasiya niha ya Îranê çiye?

dom» R:2




## Heta Dewleta Kurdistanê bê ava kirin, ji derve de destwerdan dibe

R:8



## Sendroma Stockholmê an jî bi naveki din neçarî

R:10

# Mistefa Hicrî: Hewce ye ku xelkê Îranê bi xwe, xwe bihêz bikin û li benda ti aliyekê nebin ku bên û wan rizgar bikin



**Hevpeyvîn. "Elî Budaxî"**
**W. Bêhzad Simko**

doma» R:1

**Pirsyar** - Rêzdar Mistefa, hekî bi awirek giştî, tu yê rêzdar li ser rewşa siyasiya niha ya Îranê, ew jî bi balkêşandin bi ser kirîza siyasî û pêywendiyên Komara Îslamî digel cîvaka cîhanî, şirovekirina we li derheq rewşa siyasiya niha ya Îranê çiye?

Bersiv - Rewşa niha ya Îranê li warên siyasî, aborî û civakî û berfirehtirbûna cudatiyan li navbera desthilatê û xelkê, berdewamiya vê rewşê ye ku her ji salên destpêka deshilata Komara Îslamî ve, dest pêkiriye û roj bi rojê ber bi xirabtirbûnê ve çoye heta gihîştiye rewşa îro. Pêşbînêkirina vê rewşê li berdewamkirina wê siyaset û bernameyên rêjîmê li navxweyê welat, li asta çavrêtiyê de bûye û bilî encama niha ti tişteke din, jê şîn nedibû. Bûyerek ku ev kûrahiya pareman û çêkirina karesatên komara Îslamî lezgîntir û rohntir da xuya, qonax û aliyên êrîşkirina Hemas bo ser Îsraîlê li 7ê October 2023, dest pêkir. Bi hizra min berî destpêkirina vê şerê, Îsraîlê zanyariyên li derheq vê rasiyê hebû ku Îsraîl li warê hêza esmanî ve ji Îranê bihêztir e, lê berdewamiya vê şerê bi taybet piştî êrîşa esmaniya Îsraîl bo ser rêjîma Îranê li 26ê October 2024ê, bo Îsraîlê derkevt ku komara Îslamî li wî warî de gelekê bêhêztir ji vê yekê ye ku Îsraîl hizir lêdikir.

Ji aliyek din ve, Komara Îslamî bi dilgermî û hivîdariyek zêde bi şiyana xweragiriya Hemasê û bi taybet Hizbullahê, li ser vê baweriyê bû ku ew 2 hêzane keleke berevaniya tevav ên rêjîmê ne, lê ev şer û bi taybet kuştina Îsmaîl Heniye li Têhranê û Hesen Nesrullah li Lubnanê û 10an endamên rêberatî û fermandeyên leşkerî yên wan girûpan, serdestiya Îsraîl li warê şerê esmanî û saybêrî ve çendîn qat zêdetir ji berê anî ber çavên cîhanê û bi taybet Komara Îslamî. Helbet nabe helwîstên cuda yên vê carê ya welatên Erebî û Îslamîyên deverê li hember cureke xemsariya li hember Hemas û Hizbullahê ji bîr bikin ku dibe bi nîşaneka wan hekî nebêjin dijayetî digek Komara îslamiya Îranê, belku lawaziya pêgeha vê rêjîmê li deverê de mêze bikin. Li asta navnetyewî de jî xuya ye ku komara Îslamî li qulçê tinêmaneke dijwar a siyasî û aborî de asê bûye. Lê ya ji hemûyan girîngtir, lawaziya rêjîmê û bêzarbûna zêdetir a xelkê navxweyê welat e û bi her pîverekê, bipîvin, digihîjin vê encamê ku piraniya xelkê welat, Komara Îslamî naxwazin.

**P** - Bi berçavgirtina axaftinên Xamineyî û fermandeyên leşkerî yên komara Îslamî, egera pêleke din a êrîşa rasterast a Îsraîl bi ser rêjîma Îranê heye. Li eger vê êrîşê û doma vê rewşê, bi hizra we, pêvajoya bûyeran ber bi çi qonaxekê ve diçe?

B - Hekî hat û Komara Îslamî, ji axa Îranê ve, rasterast êrîş kire ser Îsraîl, derfetek baş bo Îsraîlê dibe ku êrîşeke din bike ser Komara Îslamî ku asta kawilkariya vê dê gelek zêdetir ji êrîşên berê be û dê cihên hestiyar vê carê bike armanc, çimkî hilbijartina "Tiramp", destê Îsraîl bo êrîşeke wiha, zêdetir vekiriye. berdewamiya vê kêbirkêyê jî zêdetir bi zirara Îranê tevav dibe û li rewşek wiha, metirsiyên berfirehtirbûna zêdetir a şer tê çavrêkirin û rengê hindê nade ku karbidestên rêjîmê vê rewşê bibînin û bê lêkdaneweyê, bixwazin êrîşeke din bikin ser Îsraîlê. lewma ez pêşbêniya rûberûbûneke tund û hemû alî ya leşkerî nakim.

**P** - Rewşa siyasî, ewlehî û leşkeriya niha, çi karlêkeriyek ji milê erênî û nerênî li ser tevgera narizayetiya xelkê li Îranê kiriye?

B - Rewşa siyasî û ewlehiya niha ku şer bi giştî bi zirara Komara Îslamî tevav bûye, tevî tundûtîjbûna rêjîmê li hemebr xelkê û zêdebûna bidarvekirian û çavtirsandina xelkê, nerizayetî li dijî desthilatdariyê, her berdewam e. Xelk dest ji maf û daxwaziyên xwe bernade û tevî ku daxwaza şer nakin, lê ji dîtina lawaziyên rêjîmê û şikesta milîsên ser bi rêjîmê, keyfxweş in. xelk biçûktirîn derfetê bo gihandina peyama nerizayetî û bêzarbûna xwe ji rêjîmê bi kar tîne û seh bi vekhewî û yekîtiya zêdetir li nav gelên Îranê zêdetir dike. Bi giştî pêdagirtirbûn li ser daxwaziyên xwe, bi taybet ku xelk ji şikestên rêjîmê çi li şerên rastersat ên wan du aliyan, û çi ji şikesta milîsên ser bi rêjîmê, keyfxweşiya xwe didin xuya û her vê yekê, rêjîm zêdetir ji berê li navxwe û derveyî Îranê bi tenê hiştiye. Bi wî awayî, em dikarin bibêjin ku tevî nigeraniya xelkê ji paşeroja jiyana xwe, lê bi hivîtirin û xebatê nasekinînin.

**P** - Zêdetir ji 100 roj ji destbikarbûna kabîneya "Mesûd Pizişkiyan" derbas dibe û dibe ev 100 rojên yekem wek pîver bo pêngawên kabîneya wî bihesibînin. Li vê drheqê de çawa bas ji karnameya Pizişkiyan dikin? Herwisa lêkdaneweya we bo hinek karên siyasî yên Pizişkiyan, çine, wek mînak eva ku bo yekem car Kurdek kiriye cihgirekî xwe, ma gelo ew yek dibe wek vekirina siyasî li Komara Îslamî de bê hesibandin?

**B** - Bi awayê giştî, 100 rojên destpêkiya destbikarbûna serkomjran wek pîver tê danîn bo çawatiya derbasbûna heyama desthilata wan. Lê ez bi xwe ji mêjve gihîştime vê baweriyê ku li Îranê de sîstemeke hişik a neguher û daxistî li birêvebirina siyasî ya navxwe û derveyî Îranê, dînamîzma kar û kiryar e, ew jî rêberê giştî(weliyê feqîh) e, serkomar jî her wek beşên din li çarçoveya wan siyaset û biryarane ye ku ji beyta rehberî tê diyarîkirin, erk bi rê ve dibin, li niha de ew şarezayî û hilsengandin li asta desthilta serkomarên Komara Îslamî, ji welatên Amerîka û Ewropayê ve heta hemû welatên din ên deverê jî wiha ye. Wek mînak li wan salên dawiyê de me gelek caran bihîstiye ku berpirsên payebilind ên wan welatan jî gotine ku em hisabê li ser kiryarên Komara Îslamî dikin nek li ser dirûşmên wan.

Li pêywendî digel beşa duyem a pirsyara te, xuya ye ku diyarîkirina Kurdekê wek cihgirekî serkomar li asta xwe de bi karek baş dihesibînim lê, neku wek vekirinek rû bi azadî û geşekirin li Îranê. Çimkî vekirina siyasî pênaseyek din heye ku bi xwe hewcehî bi şirovekirin û baseke zêdetir heye. Li Komara Îslamiya Îranê de, bingeha rêjîmê ji desthilatdariya wilayeta feqîh pêk hatiye, baladestiya xwe bi ser hemû aliyên rêjîmê de sepandiye û li kiryar de dewlet û yasa û yên din, xwdiyê otorîteyeke wiha nînin ku heta hekî bixwazin, bikarin awirek ji vekirinê bidin.

**P** - Her li çarçoveya vê basê de û bo gihiştin bi encamekê li ser vê mijarê, Pizişkiyan navê kabîneya xwe bi "wifaqê millî" anku hevgirtin û hevpêywendiya hemû alî ya hemû xelkê Îranê" binav kiriye, hilsengandina we li ser vê mijarê çiye?

B - Ev yeka ku pizişkiyan kabnîneya xwe bi "dewleta wifaq" binav kiriye, her navek bê naverok e. li Îranê de dib ku her kabîneyek navek li ser hatiye danîn wek " dewleta sazendigî" yan " dewleta wifaq" û bi tenê li ser vê yekê ku cihgirekî serkomar Kurd û yêk belûç û ….hd be, kabîneya rêjîmê nabe dewleta wifaq. Li halekê de ku pêka yasaya bineretî a rêjîmê desthilat li ser binyata şerîeta îslamiya wilayeta feqîh e, bi tenê yek ziman bi fermî hatiye naskirin, axaftin li ser dewleta wifaqa millî, zêdetir wek cemeda qelandiye! Ew wifaq û yekîtiya ku Pizişkiyan îşare pê dike, hinde hatiye xuya ku ti pêywendiyek bi civak û xelkê ve nîne. Ew bas ji yekîtiya li navbera alî û taqimên beşdar li rêjîmê de dike ku her wek me îşar pêkir, ti pêywendiyek bi xelkê ve nîne. Her çiqas ku bi wan derz û tîşên ku kevtine nav hizir û îdolojî û berjewendiyên aliyên curbicur ên rêjîmê jî, ti çavnihêriyek ji kabîneya Pizşkiyan nîne ku heta pêkhateyên vê wifaqê de jî, şiyana ti karekê hebe.

**P** - Babeteke din a rojevê, zivirîna "Donald Tyrump" bo koşka Sipî ye. Li vê derheqê de şirove û lêkdaneweyên cuda hene, bi hizra we, birêveberiya nû ya Amerîka, rewşeke din li derheq Îranê de çê dike ku karlêkerî bi ser xebata seranserî ya xelkê Îranê li dijî rêjîma Îslamî de bike?

"Donald Trump" kesayetiyek pêşbênînekirî û pragmatîk e, lewma gelek zehmet e ku ji niha de, bi rohnî bibêjin çawa li ser rêjîma Îranê bernamerêjiyê dike, lê pêka reftara vî li heyama serkomariya gera pêştir û hinek kesayetiyên girîng ên dewleta wî ku heta niha diyarî kirine, ji aliyeke din ve şêwaza reftara vî digel Komara îslamî li gera pêştir bi armanca vê ku mercên xwe bi ser de bisepîne, hewlê dide ku Komra Îslamî bêxe jêr givaşeke çendîn alî, encama wan givaşan dikare li lawazkirina Komara Îslamî bi pêş ve here û li warên zêdetir de bo berfirehtirbûna nerizayetiyên giştî li navxweyê Îranê û kar û çalakiyên zêdetir a azadîxwazan, derfetan çê bike. Lê xelkê Îranê bilî egeran dibe bi xwe bo yekgirtin û xweragirî û piştrastbûn bi hêza xwe, xwe bihêz bikin û ji xebatê newestin û li benda ti aliyeke derve nebin ku bên û wan rizgar bikin.

**P** - Wek pirsyara dawî û komkirina encama hevpeyvîna me, basek li wan egerên bo Kurd û opozîsiyona Komara Îslamî de hene û ew erk û hewcehiyên ku dibe bi giring verbigrin, çine?

**B** - Eva ku niha li derveyî Îranê bi navê opozîsiyona Komara Îslamî tê naskirin, gelek lawaztir û perakendetir e ku bikare derfetên bi qazanca xelkê peyda bike. Lewma dema ku bas ji opozîsiyonê dikin, amranc opozîsiyona navxwe ye ku dibe xwe rêkxistin bike. Bo wî karî jî berî hemû tiştekê, hewce ye ku xelk li navxweyê Îranê bi hemû pêkhateyan ve, zêdetir hisabê li ser hêz û potansiyelên xwe bike. Aliyên siyasî jî hewceye ku bo pirsa çêkirina alternatîvê, dîtingeh û hêza zêdetir rû bi navxweyê welat be. Raste ku ew karek hêsan nîne lê hewce ye ku li ser bixebitin.


**Elî Budaxî**: Gelek spas rêzdar Mistefa ku te dema xwe bo vê hevpeyvînê danî

**Mistefa Hicrî**: Hûn jî mandî nebin

# Heta demhijmêrek şikestî jî rojê du caran dema rast nîşan dide!



N. Elî Munezemî



Hemû kultûr û civakên cihêreng û hemû teorîyên exlaqî li ser ewê ku derew kiryarek kirêt û dûr li exlaq e, kokin, xêncî Komara Îslamî a Îranê û karbidestên wê nebin ku derew gihîştandine bilindtirîn asta siyaseta xwe ya hikûmetdariyê. Ewa demeke ku hindek mohreyên radeya naverast di qeleqoçka desthilatdariya Îranê de yan jî hindek mohreyên wan yên rola wan hatî guhertin, derdikevin û bi rexnegirtin yan baskirin li hindek rastiyan, dixwazin wisa nîşan bidin ku hemû mohreyên wê rêjîmê wek hev dije meriv û bêexlaq nîn in. Li nawa wan mohreyan de, Mêhdî Nesîrî û Sadiq Zîbakelam bêhtir ketine ber çavan û li torên civakî de basa wan tê kirin. Lê xûyaye ku hindekan jêweye ku bi gulekê dibe buhar. Di wê gotarê de bi kurtî emê bas li sîstema derewkaran bikin.

Her wek ku hate gotin, derewkirin di siyaseta Îranê de, bi taybetî ji aliyê karbidestên hikûmetê ve, yek ji wan taybetiyên berçav e ku di dîroka hevdem a Îranê de tê dîtin. Ev reftar ji ber çend sedeman hatiye bikaranîn, ji wan jî parastina desthilatê, rewakirina kiryarên ne yasayî, xapandina raya giştî û rûbirûbûna zextên navxweyî û derve û yan jî taktîkek bo zefer birin li ser neyarên xwe de. Emê hindek ji wan xalên zeq û berçav zêdetir zelal bikin:

**Derew wek amûra xapandina rêberên neteweyên bindest:**

Îranê gelek caran li qewl û qirarên derewîn mifah wergirtiye bo ku bikare rêberên şoreşên neteweyên bindest bêxe telikê û bi kuştina wan şoreşê ji nav bibe. Ewê yekê hindek caran zerbeyên hind giran li wan şoreşa dane ku carek din pişta xwe rast nekirine. Ew yeka jî tenê bi armanca dagîrkariyê hatine kirin. Di wê bare de bixasmanî kurdan tecrubeyên zêde tehl hene ku wira de ne pêdiviye em basa wan bikin.

**Derew weke amûreke parastina desthilatdariyê:**

Di gelek haletan de, karbidestên Îranî derewan bikar tînin ji bo veşartina têkçûn, qeyranên navxweyî, yan jî xirabkarîyan. Mînakên zelal ên vê reftarê di înkarkirina pirsgirêkên aborî, danasîna statîstîkên derewîn û veşartina karesatên mirovî yên wekî tepeserkirina xwepêşandanên dijî hikûmetê an rûbirûbûna tund a bi dijberan re têne dîtin û niha wisa lê hatiye ku çi kesê bawerî bi gotin û biryarên desthilatdarên rejîmê nemaye.

**Bikar anîna derewan ji bo rewakirina polîtîkayên derve:**

Di warê siyaseta derve de, berpirsên Îranê çendîn caran hewl dane rastiyan red bikin yan jî berovajî bikin. Wek mînak carna rola Îranê di piştgirîkirina komên milîsên navçeyî yan jî bernameya navokî ya wî welatî bi awayekî eşkere tê redkirin yan jî guhertin ji bo kêmkirina fişara navneteweyî yan jî razîkirina raya giştî ya navxweyî. Her ew yeka bû sedem ku «Trump» li gera yekim a Serkomariya xwe de li peymana navokî a bi Îranê re derket û ew fersend li Îranê stand ku li aliyê Îranê ve bê xapandin. Rola xirabkarî a Îranê di nawçeya Rojhilata Navîn û cîhanê de niha zêdetir eşkere bûye û li ber hindê jî li hemû aliyan ve bin guvaşa welatên zilhêz û civaka nawnetewî de ye.

**Xapandina raya giştî û afirandina dijminekî hîpotetîk (ferzî):**

Amûrek din a rejîma terorîstî a Îranê ew e ku bi pêşkêşkirina agahdariya derewîn raya giştî bixapîne. Karbidestên wê rejîmê bi gelemperî hewl didin ku polîtîkayên zordarîyê û bertengkirinên navxweyî bi ronîkirin û şîroveya tehdîdên derve an afirandina dijminên gumanbar, wekî “emperyalîzma rojavayî” an “dijminatiya israîl” rewa bikin. Ew bo selimandina wan derewan her rojê bi rengekê şanoyekê saz dikin.

**Di krîzan de rastiyan vedişêrin:**

Rejîm di demên krîzê de, derewan dibe yek ji rêyên sereke yên birêvebirina rewşê. Weke mînak di xistina balafira Ukraynayê di Çileya 2018an de, rayedarên Îranê çend rojan rastî veşartin û tenê piştî zextên tund ên navneteweyî rastiya wê bûyerê qebûl kiribûn. Li xo krîz jî ne yek û du ne. Her roj rejîm di krîzekê de ye û gelek caran jî ji bo ku krîzekê bîra xelkê bibe, krîzek nû diafirîne. Yanî krîzan bi krîzan û derewan bi derewan divişêre.

Lê her wek ku me li destpêkê de jî bas kir, demhijmêra xirabe jî rojê du caran dema rast nîşan dide. Rejîm jî wan rojan wisa dike. Mêhdî Nesîrî derketiye ser meydayê û bas li wê hindê dike ku erê rast e ku rejîmê jî zarok kuştine, rejîmê jî teror kirin e û rejîmê jî filan û bêvan karê xirab kiriye. Ew gotinên wî jî rast in. Lê axayê Nesîrî eger rast dibêje, bo dema ku li rojnameya Keyhan de dixebitî yan dema ku karbidestek bû li sîstema ewlekariya Îranê de ew gotina nedikirin!? Nebe ku bêje wê demê haya wî lê çinebû!? Ewa dîsa hemû leyîstokên rejîmê ne ku dixwaze li hêlekê bêje xelkê ku di welat de azadiya bîrûra derbirînê heye û li hêlek din jî dixwaze bibêje ku mohreyên rejîmê bi xwe jî rastiyan dibînin û dixwazin bi xwe guhertinan pêkbînin. Lê bi serê axayê Nesîrî kim, xelk li mêjveye ku kalila wê rejîmê jê re eyan bûye û bi wan pine û perokên wî, taze xelk carek din naxape.

Ew reftar û derewên karbidestên rejîmê yên bi salan bûne sedema kêmbûna a baweriya xelkê bi hikûmetê û baş dizanin ku ew axaftinên wan cihê şik û gumanê ye. Ewan derew û berevajîkirina rastiyan kirîzên navxweyî kûrtir kirine û peywendiyên Îranê bi welatên din re aloz kiriye, derewên berdewam, rewatiya exlaqî ya hikûmetê li ber çavê gel û civaka cîhanî lawaz kiriye.

Di siyaseta Îranê de derewîn ne tenê stratejiyek demkurt e, di heman demê de taybetmendiyek sîstematîk e. Têkoşîna bi vê diyardeyê re bi reformên kûr di avahiya hikûmetê de, zêdekirina şefafiyetê û berpirsiyariya karmend û karbidestan jî têrê nake. Di dema niha de ku serdema teqîna înformasyonan e, xelk li rêyên alternatîv zanyariyan bidestve tînin û benda gotinên derwînên karbidestên hikûmetê nasekinin. Lewma çi rêyek nîn e ku ew hikûmeta bikare xwe xilas ke. Xelkê biryar daye ku xwe ji hikûmeta derewînan xilas bikin û neteweyên bindest jî biryar dane ku heta azadî û serbestiyê xebata xwe nedin sekinandin.

# Xezelwer berdewam e





N. Sîmîn Rûhanîzade

Pênc sal bi ser meha Xezelwera sala 1398an a Rojî re derbas dibe. nerizayetî xwenîşandan bi hêceta bilindbûna sê qat a nirxa benzînê ji aliyê rêjîma Îranê ve, bû sedema lêdana çexmaxa serhildanek seranserî li Rojhilatê Kurdistan û Îranê.

Li roja 24ê Xezelwera sala 1398an piştî biriyara dewleta Hesen Rûhanî bona bilindkirina nirxa benzînê, bû sedema rabûna xelkê seranserî Kurdistan û Îranê li dijî deselata rêjîma Îranê û di demek kin de pel havête nêzî 100 bajaran.

Di wê serhildanê de weke her car Kurdistan pêşeng bû, û her weke berê asta tepeser kirin û serkuta xelkê ji aliyê rejîma Îranê jî li her cihekê Îranê zêdetir bû, û hejmarek zêde ji xwenîşanderan hatin şehîd û birîndarkirin û herwisa hatin girtin û îşkencedan.

Pêla serhildan û asta bêzarî û hêrsa xelkê bi qasekê bihêz bû ku rejîma Îranê bixwe çi hêvî bi xwe nemabû, û tirsek mezin tev deselata rejîma melayan giritibû, tirsa rejîmê ji wê xwenîşandanê gehişte astekê ku Elî Xamineyî bixwe bi fermî biriyar da, bi hêz û karbidestên rejîma xwe ku bi her awayekî ku dikarin pêşiya xelkê bigirin û got ez li pişta we me.



Eva bû ku hêzên rejîma Îranê bi awayek dirindane li hember xelkê nerazî derketin û bi qutkirina hêla înternetê bo heyama nêzî du heftiyan bi hemû şiyana xwe cinayetên hovane encam dan.

Qutkirina hêla pêywendî û înternetê bû sedem ku heta niha jî beşek zêde ji wan cinayetên hov hêj nehatibine eşkere kirin.

Pêka amaran di xezelwera 98`an de Hezar û Pêncsed “1500” kes ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hatine kuştin ku nêzî 400 jin û 17 zarok jî di nava wan qurbaniyan de bûn.

Herwisa pêka wan amaran ku ji aliyê karbidestên rejîmê ve di heman salê de hatine belavkirin nêzî 7 Hezar kesan jî di vê salê de hatine binçavkirin.

Raste ku ew nerizayetî xwenîşandan bi sedema bilindbûna nirxa bênzînê serhilda, lê her di destpêkê de tevahiya rejîma Îranê û siyasetên vê rejîmê û Elî Xamineyî kire amanc.

Her weke ku me got li Rojhilatê Kurdistanê rêjeya serkutê zêdetir bû, çimkî hertim daxwaza gelê kurd digel Faris û Îraniyan cuda bûye û gelê kurd ji her derfetekê mifahê werdigire bo daxwazkirina mafên xwe yên netewayetî, û ji ber vê yekê cinayetên ku li Kurdistanê hatine kirin ji aliyê rejîma Îranê ve hovane bûn.

Her wek ku em dizanin piştî serhildana meha Xezelwera sala 1398an a Rojî, li sala 1401an a Rojî de carek din serhildanek din bi hêzek zêdetir bi navê şoreşa “Jin, Jiyan ,Azadî” yê pêsîra deselata rejîma Îranê girt.

Weke her car dîsa Rojhilatê Kurdistanê di vê serhildanê de pêşeng bû, û dîsan jî rêjeya şehîd, birîndar, binçavkirî û sepandina cezayên giran biser welatiyan de li Kurdistanê gelek zêdetir li bajarên din yên Îranê bû.Ger em bixwazin basa cinayetên rejîmê li Kurdistanê bikin bi salan jî bi dawî nayê.

Eva ku li vir ez dixwazim bêjim eva ye ku raste 5 sal bi ser meha Xezelwerê re derbas dibe, lê her sal bi awayekê cuda ev meh li Kurdistanê dubare dibe, mînak li şoreşa Jînayê de di meha Xezelwerê de tenê di rojekê de 66 kes li bajarên Rojhilatê Kurdistanê hatin şehîdkirin, û heta niha jî ev cinayet bi awayên cuda berdewam in, mînakek din bo wan cinayetan di meha Xezelwera îsal de jî ji aliyê rejîma Îranê ve cezaya îdamê bi ser keçên Kurd di girtîgehê de tên sepandin û Virîşe Muradî û Pexşan Ezîzî di bin siya îdamê de ne û çendîn cinayetên din ku rojane tên encam dan li dijî netewEya me.

Xezelwer heta Xezelwerê, roj û meh û sal birîneke li ser cesteya gelê me û heta ku ev rejîma han mabe ew birînên me yê her dê bimînin, lê di hember de berxwedan û xebata me jî li dijî rejîma dagîrker dê berdewam be.

Weke ku malbatên mafxwazan yên şehîdên serhildana Xezelwera sala 1398an îsal di salvegera serhildana Xezelwerê bi belavkirina daxuyaniyekê ragihandin ku heta ku Komara Îslamî ya Îranê ax û jiyana me qorix bike eva berxwedan û xebata di meha Xezelwerê li dijî rejîmê dê berdewam bin.

Di dawiyê de hêjayê gotinê ye ku heta Kurdistan xwediyê jinên pêşeng, malbatên mafxwazên şehîdan, girtiyên siyasî yên xweragir û gelê bi hest û mafnas û mafxwaz be eva sîbera tirsa gelê Kurd dê her li ser serê dagîrker be.

# Menceníqa sernixûniya rêjîmê li jê dorpêçên tund de



N. Serbest Urmiye




Dorpêça nû ya Yekîtiya Ewropa li ser keştiyên Îranê , derfeteke din bo bizava hilweşandina rejîmê zêde dike.

Yekîtiya Ewropayê, ji ber ku bikare di rêya zext û givaşê de li hember rejîma Îslamî ya Îranê seba bernameya navokî, rewşa nebaş a mafên mirovan û piştgiriyê ji taqimên terorîstî yên herêmê û ... bisekine, di salên borî de dorpêçên cuda bi ser rejîmê de sepandine ku yek ji wan dorpêçan li ser dezgehê keştiyên Îranê bûye û car din di rojên borî de hatiye nûjen kirin.

Cezayên han di warên curbecur de bandor li ser pêkhateya rejîmê hebûne û ji nû ve nûjenkirina boykotê li ser keştiyên Îranê ji aliyê Yekîtiya Ewropayê ve, bi taybetî di rewşekê de ku rejîma Îranê bi sedema piştevaniya ji taqimên terorîstî li heremê de ji aliyê navxweyî û derve de, siyaset û tikiliyên navneteweyî û rewşa nebaş a aborî, rastî pirsgirêkan bê çareser weke bêkarî di asteke zêde bilind de, bilindbûna enflasyona(pendambûna) aborî, hatiye û rû bi rûyê nerazîbûna gel bûye, dibe sedema ku tevgerên nerazîbûnê li dijî rejîmê biheztir û berfirehtir bibin .

Ev ceza ji bilî zêdekirina zextê li ser hikûmetê, xwedî potansiyeleke zêde ye ji bo berfirehtir kirina meşên nerazîbûnê yên siyasî û civakî û di heman demê de jî berdewam bûn û asta kêrhatîbûna rejîmê di rû bi rû bûn tevî qeyran û serhildana gel de ber bi pêkoleke micid ve dikeşîne.

Boykota nû ya li ser keştiyên Îranê ji aliyê Ewropa ve dikare bi awayekî nerasterast bandoreke berfireh di rêyên aborî, psîkolojî û civakî alîkar be bo bihêzkirina tevgerên nerazîbûnê, ji wan tevgera "Jîna"yê li dijî Komara Îslamî. Encam û bandora boykota nû dikara bi kurtî wiha were şirove kirin:

1- Ji aliyê aborî û civakî ve:

Zêdebûna bihayê hewcehiyê jiyanê, nebûna hewcehiyên bingehîn û kêmbûna dahata hikûmetê, zêdebûna rêjeya enflasyonê û têkçûna ticaret û hinardekirinê ji ber cezayên nû, zexta aborî li ser tex û qatên cuda yên xelkê zêde dike û bi taybetî bandorê li ser qata destkurt û navendi didanê.

Ev pirsgirêk bi taybetî di nav ciwan û jinan de ku komên civakî yên herî mexdûr tên zanîn, zêdetir dibe sedema nerazîbûn û bê hêvî bûnê.

Di encamê de dikare bizava nerazîbûna gel zêde berfirehtir bike û bibe sedema bihêzbûna tevgerên siyasî û civakî li dijî rejîmê, yek ji wan tevgera "Jîna"yê. Ji ber ku komên nerazî ji bilî daxwazên civakî û siyasî, daxwazên aborî jî dişopînin.

Ji ber vê yekê jî berhevdan û lihevkirina daxwazên cur bi cur yên tex û qatên civakê, dibe derfeta ji bo xurtkirina yekîtiya civakî û komên ku berê jî rasterast ji tevlî serhildana nebûne, vê care derfetê peyda dikin tevlî meşê bibin.

Weke nimûne heke komên bazarî û kedkaran tevgera"Jîna"yê de bandora rastewxwe jî çinebûn dê tevlî refên rêxistina gel bibin.

Ya herî girîng ew e ku tevgera jinan li dijî newekhevî û tun û tûjiyê li dijî jina xurt dibe û di heman demê de têkoşîna jinan bi komên cuda yên siyasî û civakî re ji bo bidestxistina mafên mirovan xurt dibe.

2- Daxwaziyên siyasî û xurtkirina gotara guhertina rejîmê

Rast e ku xwesteka tevgerên din ên nerazîbûnê di destpêkê de guhertinên civakî û siyasî li welat de bû, lê di bin xexta ku boykot a han bi ser xelkê de disepîne, derfetê çêdibe ku meydana bizava wan berfirehtir bibe û weke tevgera "Jîna"yê daxwaza guhertina rejîmê bikin.

Vê demê diruşma xwepêşanderan dê hilweşandina sîstemê û bidawîhatina siyaseta aborî û derve ya Komara Îslamî ya Îranê be.

Ji aliyekî din ve, nûkirina cezayan, bi taybetî di warê keştiyan de, rejîmê di birêvebirina qeyranan û çareserkirina pirsgirêkên aborî de rû bi rûyê gellek arîşe û pirsiyarên bê bersiv dike ku nîşan dide ku rejîm nikare çareseriya wan pirsan bike, lewma komên ciwan û çînên navendî yên civakê bi daxwazên radîkaltir derdikevin û tekoşîna hilweşandina rejîmê xurttir dibe.

3- Zêdebûna asta serkutê û berteka medyaya cîhanî

Bê guman her weke ku çawan berê, rejîm di karname û derbasbûya xwe de Serkût û fetisandina dengê nerazî tomar kiriye, vê carê jî di bersiva dengên nerazî de dê weke berê û dibe ku bihêztir jî siyasetên tepeserkirinê yên wek girtina çalakvanan, qutkirina hêla Înternetê û bikaranîna zêdetir a hêza leşkerî bidomîne.

Di wir de tepeserkirin dibe sedema zêdebûna nerazîbûn û bilindbûna dengê gel û berfirehbûna tevgera nerazîbûnê û xelkê tê haydan ku bi terzeke çalaktir tevlî serhildanê bibin.

Di rewşeke wiha de ye, medyayên cîhanî û rêxistinên mafên mirovan zêdetir bala xwe didin rewşa hundir a Îranê ku dikare alîkariya her tevgerekê bike ku li dijî rejîmê serhildide.

Vê deme medyayên cîhanî tên gaziya gel de û dengê gel li dijî rejîmê cîhanî dibe. Eva di demekê de ye ku gelek welatên rojavayî bi sedema binpêkirina mafên mirovan hewl didin zext li ser Komara Îslamî were danîn.

Bi giştî, boykot û dorpêça nû ya li ser keştiyên Îranê ji aliyê Yekîtiya Ewropayê ve dikare di rêya zexta aborî, siyasî û civakî de, bibe alîkar ku tevgerên nerazî, yek ji wan tevgera "Jîna"yê, bihêztir bibin.

Di rewşeke wiha de û ji ber zextên aborî yên ku di encma van cezayan bi ser civakê de hatine sepandin, dengê nerazîbûna gel bilindtir û qeyranên civakî xurttir dike.

Vê demê daxwazên radîkal di civaka nerazî de zêdetir dibin û di hember de jî zextên zêdetir ji aliyê rejîmê ve dîsan dibin alîkar ku serhildana guhertina rejîmê him di hundir de û him jî di asta navneteweyî de bihêztir bibe.

# Bicîh anîna daxwazên acîl ên kurdan, nabe ku bi rawestan-dina şerî ve bêne girêdan



Mustafa Özçelik




Mustafa Özçelik Serokê Giştî yê Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) li konfiranseke de li Parîsê bo beşdaran ku piranî nûnerên part û aliyên siyasiye Kurd li her çwar perçên Kurdistanê bûn axivî: Belê, hema hema herkes behsa yekitî, hevkarî û tifaqan dike. Lê mixabin di encamê de, huna, ji bo yekitîyên sîyasî û rêxistinî de jî, di derebarê hevkarî û tifaqên neteweyî de jî tu berhemeke beketî di destên me de tuneye. Di rewşeke weha de, PAK û TDK-TEVGERê, berjewendîyên neteweyî û niştimanî esas girtin û biryara yekitîyê dan. Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) jî di encama vê biryarê de, bi yekitîya PAK û TDK-TEVGER û kadroyên serbixwe hate damezrandin. PWKye, derzeke mezin li wê atmosfera neyênî ya di derbarê yekitîyan de xist.û vaye saleke jî damezrenerên PWKyê vê hişmendîya nû di nava xwe de dihûnin.Em hêvî û bawer dikin ku dê ev gava pîroz bi awayekî xurtir berfireh bibe, ji sîyaseta bakurê Kurdistanê re dê bibe nimûneyeke hêvîdar. Îro li Bakurê Kurdistanê pêwîstîya me bi partîyeke xurt an neteweyî, demokrat, azadîxwaz, kurdistanî heye; PWK di vê meşê de gaveke, rawestgehek e.'.

Dîyare ku, Aqilmendên Dewleta Tirkîyeyê, bi destên Serokê MHPyê Devlet Bahçelî û bi erê kirina Serokkomarê Dewleta Tirkîyeyê Recep Tayîp Erdogan projeyeke nû anîne rojevê. Herweha partîya mixalefetê CHP jî li gel hinek têbinîyên xwe, piştgirîya vê projeyê dike.Lê tiştê dixuyî, tengasî û krîzên Dewleta Tirkîyeyê yên aborî, sîyasî, civakî, dîplomatîk û rûdanê vê dawîyê yên li Rojhilata Navîn, ji bo ji nû ve parastina berjewendîyên Dewleta Tirkîyeyê hatîye rojevê.Helbete ku Dewleta Tirkîyeyê ji berjewendîyên xwe gelek kartên cuda bi bêrîka xwe de veşêre.Lê helbete ku dê hesab û planên Dewleta Tirkîyeyê hewbin; lê belê, êdî Dewleta Tirkîyeyê dê nikaribe, vê sîyaseta xwe ya înkar, asîmîlasyon û dijayetîya kurd wek berê berdewam bike. Em bangî Dewleta Tirkîyeyê jî bangî PKK, Ocalan DEM Partîyê jî dikin da ku, heger dê hinek gav bêne avêtin, divê ji bo çareserîya pirsa kurd û Kurdistanê bêne avêtin. Helbete ku divê mafên însanî û hiqûqî yên Ocalan jî yên Demîrtaş û hemû kesên di zînadanan de jî bêne dayîn; divê hemû kesên ku ji ber fikrên xwe, ji ber xebatên xwe yên sîyasî, demokratîk, sivîl hatine girtin, hatin ceza kirin bêne berdan û divê hemû dozên hatine vekirin ji holê rabin, kesên ku ji ber cezayên ku xwarine mecbûr mane ku welat^exwe terk bikin, bila bikaribin vegerin welatê xwe.Em dibêjin divê mesele bi rakirina tecrîda Ocalanî ve neyên teng kirin û asê kirin. Divê Dewleta Tirkîyeyê hemû operasyonên xwe yên leşkerî yên li ser Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê rawestîne. Divê PKK dawî li çalakîyên xwe yên çekdarî yên li Bakur û Başûrê Kurdistanê bîne. Divê Dewleta Tirkîyeyê ji bo çareserîyeke sîyasî, demokratîk, sivîl, nûnerên gelê Kurdistanê, hemû partîyên kurdan, dezgehên sivîl û kesayetên qebûlbar ên li Kurdistanêmixatab bigre.Divê hevdîtin ne li pişt derîyan, bi awayekî veşartî; bi awayekî vekirî û şefaf bi hemû alîyên kurdan re bêne meşandin. Divê îro ji bo rê ji çareserîyeke mayinde re vebe, nasnameya kurdan, perwerdeya bi zimanê kurdî, fermîbûna zimanê kurdî di Qanûna Bingehîn a Tirkîyeyê de bêne bicîh kirin û garantî kirin. Divê Dewleta Tirkîyeyê hemû peymanên navneteweyî yên îmze kirine, bicîh bîne.

Divê azadîya ramanî, rêxistinî bê garantî kirin û qedexeyên li ser navê Kurdistanê ji holê rabin û partî û dezgehên bi navê Kurdistanê bikaribin bi awayekî azad xebatên xwe bimeşînin. Dewleta Tirkîyeyê bêyî ku şerê PKKyê bike bahane, div^eji bo bicîhanîna van daxwazên acîl ên miletê kurd gavan bavêje.

Herweha divê PKK, Ocalan, DEM Partî jî, ne bes rakirina tecrîda Ocalanî; berîya her tiştî van daxwazên rewa ên miletê kurd derxînin pêş.

Ji bo çareserîyeke mayinde ya pirsa kurd û Kurdistanê jî divê hevdîtinên bi garantorîya hêzên navneteweyî û Rêveberîya herêma federe ya Kurdistanê bêne meşandin.'

Li derheq girîngîya pewywendîyên nevneteweyî û tifaqa navxweyî ya kurdan, Dîroka me gelek caran daye îspat kirin ku, di bidestxistin û rêlibergiritina mafên neteweyî, demokratîk ên miletê kurd de dewletên mezin geşlek caran rola tayînker lehîstine. Bi taybetî di sala 1991ê de, beşeke Başûrê Kurdistanê bi rêlêvekirina Emerîka, Fransa û dewletên hevpeyman hate rizgar kirin. Di sala 2003yê de, piştî ku rejîma Sedam Husênî, bi destê Emerîka û hevpeymanên wê ve hate rûxandin, wek ferMî federalîya Herêma Kurdistanê di qanûna Bingehîn a Irraqê de hate bicîh kirin û hemû dewletên cîhanê ev mafê federalî yê herêma Kurdistanê bi awayê fermî qebûl kirin.Qebûl kirina mafê federalî, derzeke mezin li Peymana Lozanê xist û ev derz hêdî hêdî ber bi Rojavayê Kurdistan^eve diçe.

Şerê Îsraîlê yê bi Îran, Hamas, Hizbûlahê dikare vê derzê bigihînî Rojhilat û bakurê Kurdistanê, dikare derza li Başûrê Kurdistanê mezintir bike û şikestina beşeke vê peymanê bi xwe re bîne û li Rojavayê Kurdistanê jî derzâ ku li peymanêketîye kûrtir bike. Di demeke weha hesas de, îro hêzeke herî mezin a di destê kurdan de de ewe ku li cîhanê dostên xwe zêde, dijminên xwe kê bikin; hêza din ya esasî jî, pêk anîna tifaqên neteweyî, demokratîk, niştimanî navxweyî yên li her perçeyekî Kurdistanê; li Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê hevkarîya li ser daxwazên acîl ên kurdan û hemahengî, koordînasyon, dîyalog û hevfêhm kirina di navbera her çar paerçeyên Kurdistanê de ye'.

Xebatên li dîasporayê ji bo piştgirîya doza azadîyê ya li her perçeyên Kurdistanê hêzeke gelekî girîng e. Lê, xebatên dîasporayê pir alî ne. Ne bes ji piştgirîya têkoşîna li perçeyên Kurdistanê pêk tê. Xebatên lobîyê û dîplomasîyê heykelekî esasî yê xebatên li dîasporayê ne. Em baş dizanin ku em di qada navnetewî de, em çiqasî dostên xwe zêde, dijminên xwe kêm bikin,dê rêya azadîya miletê me û welatê eme ewqasî hêsantir û kurtir be.Herweha xebat, têkoşîn û lêxwedî derketina mafên însanî, hiqûqî, demokratîk yên kurdên li dîasporayê jî beşeke esasî ya xebata li dîasporayê ye. Lingekî esasî yê xebata li dîasporayê jî, ji lêxwedîderketina ziman, kultur, dîrok û hişmendîya neteweyî ya miletê kurd e. Divê hemû malbat û dezgehên kurdan fêbûna zimanê kurdî, weke wazîfeyeke esasî bikin beşeke jîyana xwe.

Bi ya me, bi vê perspektîf û rêbazê divê hemû dezgehên neteweyî, niştimanî yên li dîasporayê bibin yek û temsîlîyeketek bihêztir ava bikin. Em bangî hemû dezgehên li dîsporayê dikin da ku ''Yên dikarin bibin yek bila bibin yek; yên nikarin bibin yek bila hevkarî û tifaqan bikin; yên nikarin hevkarîyê bikin bila di nav dîyalogê de bin; yên nikarin nev dîyalogê de jî bin, bila dijminatîye hev nekin'.

## Nerîna




**“Josep Burrell”:**

**“Divê YE li benda biryara Trump a bo piştgirîkirina Ukraynayê nemîne”**



**“Benjamin Netanyahu”:**

**“Êrîşa tolhildanê ya Îsraîlê derbe li beşekî taybet ji bernameya navokî ya Îranê xist”**



**“Şî Cîping” :**

**“ Dubare helbijartina Donald Trump wek serokê Amerîka dibe sedema alozî û guhertinan li cîhanê”**



**“Volodymyr Zelensky”:**

**“ Ger Amerîka alîkariyên leşkerî yên ji bo Kîevê rawestîne, Ukrayna dê şerê xwe yê li dijî Rûsyayê de şikesdê bixwe”**

# Ev ne xwepêşandan, belkî serhildan e!



**N. Eskender Ceiferî**



Malbatên şehîdên serhildana Jînayê û welatî, serî li ser gorên şehîdan didin û tevî bîranîna wan, soza xwe bi rêbaza serhildêran re dupat û nû dikin.

Xwepêşandanên vê dawiyê yên li dijî rêjîmê jî weke cejna netewî ya Newrozê bûne remza şoreşê. Lê belê niha êdî piştî du salan, ew ne xwepêşandan in, êdî ew serhildan e li dijî rêjîma dagirkar a deshilatdar li Têhranê.

Heya niha zêdetirî 150 serhildêr li Kurdistanê hatine şehîdkirin, lê tevî vê jî serhildêr dev ji xwestekên xwe ji bo guhertina rêjîmê bernadin.

Rast e ku xwepêşandan, wek berê nema ne.

Lê belê xelk guh nade gefên dagirkar û hertim serhildêrên şehîd bi Ala Kurdistanê û bi cemedaniyê bi bîr tînin.

**Di dîroka hevçerx de, ti yêk ji wan desthilatan ku Kurdistan dagir kirine, nexwastine lihevcivîna Kurdan bi rengekî ciddî were pêşwazîkirin. Rojhilatê Kurdistanê jî parek ji vî welatê birîndar e.**

Komara Îslamî, weke rêjîma Pehlewî, riftarê bi Kurdan re dike û lehengên Kurdan tenê ji ber pêkanîna çalakiyekê bi dehan salan di girtîgehan de dimînin.

Aliyên siyasî yên Rojhilat, di vê serhildanê de li ser xwepêşandanên girseyî ji bo şermezarkirina şehîdkirina Jîna Emînî lihev hatin.

Belkî ev, zengila metirsiyê be ji Komara Îslamî re. Ji Ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, hemû partiyên çepgir, parêzvanên mafên netewî, nasyonalîst û komonîst ên Rojhilatê Kurdistanê li hev nêzîk nebibûn.

Tevî ku rêjîmê bajar û navçeyên Kurdistanê mîlîtarîze kirine, lê dîsa jî serhildan her didome.

Rêjîma dagirkar a Komara Îslamî ya Îranê, tevgera partiyên Rojhilatê Kurdistanê bi hûrî dişopîne.

Heya partiyeke Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, dagirkar wate Komara Îslamî jî nîgeran e.

**Piştî biryara han a pêşwaziya meşên şermezarkirina şehîdkirina Jîna yê ji aliyê partiyên Kurdî ve, tevgereke mezin di nava Spaha Pasdarên Îranê de çê bûye. Ew ditirsin vê carê Rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan.**

Zanyariyên veşartî ji nava Spahê amaje dikin ku bajarên Sine, Urmiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke ya hêzên wê rêxistina têrorîst.

Bi vî rengî ku endamên Spahê, di nava xelkê sivîl de digerin û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku basa xwepêşandana hevpar a aliyên Kurdî bike, bê girtin, Ji xwe heya niha dehan kes jî hatine girtin.

Ji xeynî cehdên Spaha Pasdaran, selefî jî li hemberî nasyonalîstan têne çalakkirin.

Plana herî dawî ya Îranê ew e ku derfetê bide rêxistinên tundrew da ku nasyonalîzma Kurdî di landikê de bifetisînin.


Li gor zanyariyên çavkaniyeke veşartî ya saziya Îstixbarat angu Îtilaata Îranê, heger tevlîhevî yan jî dîsa serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî desthilat çê be, dibe ku ji bo dijatiya hêza Kurdan, mifah ji aliyên selefî jî were wergirtin.

Ev du sal in, rêfrandûma serxwebûna Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê tevahiya partiyên Rojhilat ve bi rêve diçe. Her yek ji wan, sloganekê ji bo azadiya niştîman hil dide. Taktîk jî cuda ne.

Lê armanca hevpar, bûye sedem da ku hemû, hevdeng, bang li neteweya Kurd bikin heya dakevin kolanan û dilê dagirkar bihejînin û car din jê re bêjin ku evder welatê me ye û em ji bo pêkanîna tevgeran li ser axa xwe, îznê ji ti kesekî naxwazin û rabûna me, dengê dijatiya me ya li hemberî dagirkar e.

Êdî çiyayên Zagrosê, hemûyan dest dane hev û ji Agirî, heya Bozê Sîna, ji Kêleşîn heya Arbaba û ji Dalaho heya Şaho, dengê pêşmerge di nav keç û xortên Kurd de reng vedide û ewê bi tîrêjên agir û rojê û bi qêrînên dilên dayîkên şehîdan herin pêşwaziya serhildanê û tevî hemû rêwşûnên tund ên ewlehî ji aliyê rêjîmê ve, nêzîkatiya xelkê bi mijarê re germ e û rêfrandûma me wê birêve biçe.

# Heta Dewleta Kurdistanê bê ava kirin, ji derve de destwerdan dibe



N. Îbrahîm Guçlu




Çend hefteyê ku Dewlet Bahçeliyê nijadparest, gelek aşiqê Ocalan û PKKê ye. Di vebûna Meclîsê de silav da DEMiyan û destên wan hejand. Piştre jî di Civîna Grûba Meclîsa xwe de daxuyakirin ku "Ocalan heger dixwaze û bikare PKKê kane bike û ku dest ji çek berdin, bila bê di Meclîsê de di Civîna Grûba DEMê de biaxive û bibêje ku ez li dijî terorê me û PKKê divê dest ji çekê berde. Wê demê mafên wî yên ji hepisê derketin dikare pêk bê û ew li mal hepis bibe."

Dewlet Bahçelî piştre ew daxwaz û nerînên xwe di Meclîsê de û di çend Cıvînên Grûba Partiya xwe de jî dîsa diyar kir.Diyar bû ku di destpêkê de ji ev nerînên wî R. T. Erdoğan ne agahdar e. Loma jî demekê bê deng ma. Piştî çend rojan diyar kir ku "tu bangeke wan ji bona PKKê tune ye.

Kurd mixatabê wan e." Diyar bû ku R.T. Erdogan, partî û hikûmeta wî ji Pêvajoya çareserîyê ders derxistibûn ku PKK dev ji çek bernade. Pirsgirêke Kurd jî ne PKKê ye û ji derveyî PKKê ye.

Mixabin her çiqas sedema daxuyaniya Dewlet Bahçelî gelek vekirî bû û helwesta Erdogan, partî û hikûmeta wî bi awayekî girtî diyar bû jî, beşek Kurdan ji daxuyaniya Dewlet Bahçelî wateyên mezin derxistin, hêvî kirin ku aşitî dê ava bibe, Navenda PKKê ya li Qendîlê dê Ocalan guhdar bike, dê mafên kurdan bên dayin û PKKê jî dê dest ji çek berde.

Heta wek bersîvê PKKê êrîşî TUSAŞê kir jî, nehat fahm kirin ku PKKê dest ji çek bernade. Beşek kurdan dest ji çîroka xwe bernedan.
Min nivîsand ku daxwaza Dewlet Bahçelî aşitiya ne di nav Kurdan û Tirkan de ne. Lewra Bahçelî ji mafên Kurdan qal nake, dest ji çekberdana PKKê dike. Di wî de tirsa guhertina sînoran, encama guhertina sînoran jî avabûna Dewleta Kurdistanê çêbibû.

Wî sedema guhertina sînoran jî girêdayî Dewleta Îsraîlê û Emerîkayê aşkere dikir. Gelek vekirî got ku "îsraîl ji PKKê re alîkarî dike. Terora li hemberî TUSAŞê jî bi daxwaza îsraîlê ji aliyê PKKê ve çêbû."Dewlet Bahçelî him vê rastiyê diyar dike, him jî hêvî dike ku PKKê dê bi daxwaza Ocalan dev ji çek berde.

Lê tê zanîn ku PKKê dest ji çek jî berde, di navbera Kurdan û Tirkan de aşitî çê nabe. Ceribandina dîrokî ya neteweya Kurd vê yekê gelek zelal derdixe holê. Aşitî dema ku bir her rengî mafên kurdan hatin nas kirin, Kurd û Tirk ji aliyê statuya siyasî û mafên neteweyî de wek hevdu bibin, dewlet bibe dewleta Kurdan û Tirkan yanî dewlet bibe dewleteke federal bi awayekî wekhevî dê çê dibe.

Min û gelek kurdperweran û kesên Doza Kurd û Kurdistanê armanca Dewlet Bahçelî gelek bi zelalî aşkere kirin. Hezar mixabin Kurdên xwenda yên rûhên xwe yên kurdbûnê wenda kiribûn, li heman tembûrê xistin û hîn jî ew helwesta xwe didomînin. Hemû dewlet ji bona berjewendiya xwe ya dewletbûnê tevdigerin. Bûyerên li herêma xwe û li dinyayê gor berjewediya xwe terîf dikin û jê sûd werdigrin.

Ev qanûneke xwezayî û navneteweyî ye. Loma jî dewletek bibêje ku ez ji bona berjewendiya xwe bûyerekê bi kar tînim, lê dewletek û an dewletên din divê bûyeran ji bo berjewedniya xwe bi kar nînin, ev korî û ehmaqî ye. Loma jî, dewleta Tirk ji bona berjewendiya xwe ya pirr alî ji Dewleta Filîstînê re û ji Hamasa terorîst re piştgirî dike.Li hemberî Îsraîlê dijmintiyeke gelek xurt dimeşîne. Dîsa tê zanîn ku Dewleta Tirk ji bona berjewendiya xwe û ji bona Tevgera Bakurê Kurdistanê û Rêxistinên Kurdistanê tasfiye bike PKKê proje kir û bi awayekî gelek xurt bi kar anî.

Dewleta Tirk sed sal e ku ji bona Neteweya Kurd dewleta xwe ava neke, destwerdana Tevgera Rizgarîxwaz ya Kurdistanê li Iraqê, li Îranê û li Sûriyeyê kir û dike jî. Nûha jî Îran û Sûriyeyê û Rûsya û nîjadperetên Iraqê PKKê ji bona berjewendiya xwe li hemberı Dewleta Tirk bi kar tîne.

Di van çend rojên dawî de daxuyaniya Wezîrê Karên Hûndir yê îsraîlê diyar kir ku "Kurd û Cûhî li Rojhelata Navîn bi serhêjmar du neteweyên hindik in. Loma jî her du netew li Rojhilata Navîn tîfaqkarên xwezayî ne. Neteweya Kurd di nav sînorên çar dewletan de, di sînorê Dewleta Tirk, Îran, Iraq, Suriyeyê de dijîn. Ji serxwebûna xwe ya siyasî bêpar, neteweyekî mezin e."


Ew jî diyar dike ku Îsraîl jî dixwaze ku ji bona berjewendiya xwe Kurdan û PKKê li hemberî dijminê xwe Dewleta Tirk bi kar bîne. Ev jî helwestekî xwezayî ye. Divê dema Dewleta Tirk Filîstîniyan û Hamasê li hemberî Dewleta Îsraîlê bi kar bîne. Îsraîl jî hemû enstrûmanan û Neteweya Kurd û PKKê dê bixwaze ku li hemberî Dewleta Tirk bi kar bîne.

Di encamê de dikarim bibêjim ku heta Dewleta Kurdistanê ava bibe, dewlet dê ji bona berjewendiya xwe destwerdana Tevgera Kurdistanê bikin, bi rêxistinên Kurdistanê re danûstandin bikin.

Neteweya Kurd jî dê wek hemû neteweyan, neteweya Tirk û neteweyên din yên li Rojhelata Navîn ji bona berjewendiya xwe tevbigerin. Dê bi kîjan dewletan danûstandin bikin dê biryar bidin.



# “Dûrûyî”



N. Vênûs Faqyîq
W. Hesen Mukerem



Mirovê ku ji bo xwe û hemû mexlûqên din ên li ser rûyê erdê metirsiyê dixwe, min îqna kir ku erd cihê herî xedar a jiyanê ye.

Tu ajalek bi qasî mirovê ku bi rêbazên herî hovane yên tinekirina cureyên xwe re mijûl dibe û rêyên kuştin û tinekirinê veguherandiye bazirganiyê û qezenckirina pereyan, hemû îdiayên jiyaneke kêrhatiyê mirovahiyê pûç dike, ne zalim e.

Vê hovîtiyê sînorên madî derbas kiriye û bûye sedema felaketeke manewî.

Li ser Înternetê û medyaya civakî, hûn bi berdewamî rastî gelek dozên weha yên tirsnak dibin, ku ji we re dubare dikin ku mirov afirîdên tevlihev, bêîstîkrar û şaş in, û xwedan şiyana guheztina rengan, danîna maskeyan û bi kalîte baş tevdigerin.

Ew xwedan jêhatîbûnek baş e ku xwe ewqas bi ronî îfade bike ku heke hûn ne xwediyê hişmendiyek kûr bin, hûn ê cûdahiya mezin di navbera tiştên ku li ser medyaya civakî têne gotin û cewhera rastîn a mirovan de fam nekin.

Bi dîtina min yek ji wan tiştên ku ji xeynî neheqî û xiyanetê ne hêjayî dilovanî û lêborînê ye, durûtî ye.

Di feraseta durûtiyê de derew, dizî û zordestî bi awayekî berbiçav xwe dide der, ji asta herî biçûk heta asta herî bilind, weke dewletbûn, siyaset û rêveberiya civakê.

**Civakên ku kapîtalîzm ezimûn kirine, ezmûna herî dijwar a durûtiyê heye, ji ber ku yek ji encamên tirsnak ên pergala kapîtalîst şer û derketina cûreyek pêşbaziyê di nav mirovan de ye, bi taybetî di warê aborî de, ku civakê ji holê radike.**

Ji ber vê yekê em ku doza azadiyê dikin, bêyî ku em pê zanibin, feyde ji hewaya azadiyê werdigirin ku xwedan şiyanek ecêb a derew û durûtiyê ye, lê azadî di wateya zanistî de tê wê wateyê ku mafê we heye ku bibê ku neçarî, hûn derewan bikin û bê durûtiyê, qala ji wê azadiyê bikin hêsantir.

Ev jî encama pergala exlaqî ya civakê ye ku pergala rêveberiyê ya ne tendurist diafirîne.


Madem ne durûtî ye, çima desthilatdarek di axaftinên xwe de vî welatî wek bihuşta li ser rûyê erdê bi nav bike, ku ew bi xwe tu destkeftiyên hêjayî gotinê nînin û jiyana wî bi dehan carî ji jiyana mirovan şahîtir e?

Dema ku durûtî bibe yek ji taybetmendiyên herî diyar ên mirovî, dibe taybetmendî û şêwazek ramanê û bingehek ji bo afirandina cûreyek hişmendî û cîhanbîniyek xirab û xedar.

**Desthilatdar dema hin pîvan û nirxên mirovatiyê diparêzin, di pratîkê de berevajiyê wê yê gemar ku jiyana mirovan diêşîne dike û hûn dibînin ku ya herî bi qîmet deng û gazincên gel e.**

Ji ber vê yekê hûn pê bawer dibin ku tu wateya diyalogê bi tu desthilatdaran re tune ye, ji ber ku her tiştî, munafiq xwedî qabiliyeteke bilind e, derewkarek mezin e, şiyanek nedîtî ye ku hincet û nîqaşan bike ne di navbera we û wan de, lê di navbera wan de Ew di modelên rolê de ye.

Di dawiyê de, ew ê wan hemî di kaxizên prensîbên biriqandî de bipêçin û wan bi bihaya herî bilind bifroşin we bêyî ku hûn biryar bidin, ji ber ku hûn li hêviya jiyanek ku bi kêmanî mirovahî ji we re peyda dike.
Ji ber vê yekê fikra ku erd ji bo jiyana mirovan cihê herî xeter e.



# Sendroma Stockholmê an jî bi naveki din neçarî





**N. Kofîxwar**

Sendroma Stockholmê nexweşiyeka derûnî ye. Navê xwe bi bûyereka di sala 1973 an de li Swêde ya bajarê Stockholmê qewimiye hildaye.

Li wê salê di Stockholmê de dizan bona şêlandina bankeyekê dikevin hundirê bankê, 4 erkdarên bankê bona daxwazên xwe dîl digrin.

Diz qurbaniyan 6 rojan tev dikin qaseyeka bankê. Di wan rojan de yên dîlgirtî bi her gotinên dizan bi cî tînin û tu carî li dijî wan seknekê nagrin.

Ji ber wê jî di nav wan de tu pirsgirekêk, xerabiyek çênabe. Bi ser de di nav wan de bi dilxwazî tekiliyên baş çêdibin.

Dîlgirtî her roj bêtir li hemberî dizan hestên dilsozî hîs dikin. Rewşa xwe ji bîr dikin, zordarên xwe wek mexdûr dibînîn êdî ji bo wan her roj ber xwe dikevin.

Piştî 6 rojan ku ji aliyê polîsan rizgar dibin û rênadin tu kes dizan biçûk bixin, bê rûmet bikin. Dîlgirtî çawa ku azad dibin ji bo ku diz jî azad bibin dixebitin, kempêynekê çê dikin pereyan berhev dikin, bona wan parezeran digrin.

Di heman salê "psîkîyatr û krîmînolog Nils Bejerot" helwest û sekna dîlgirtiyan ne asayî pênase dike. Dibêje hevxemiya dîlgirtiyan ji aliyê dizan ve manûpûlasyona mêjiyên wan e.

Ji ber ku dizan hem ew dîlgirtine hem jî xwe mexdûr nîşan danîne. Di alîkî de jî têkiliyên baş çêkirine ku dîlgirtî şêkirandina wan bikin.

Bi zanetî an jî ne zanetî lê ew kirine. Piştre pisporan ew helwesta dîlgirtiyan wek nexweşiyeke derûnî bi nav kirine.

Mirov, kom an jî beşek kêmanî heger bindest be an jî dîl bikeve, demeke dûrûdirêj rastî zilmeke ji dûrî aqilan, jenosîdkar û pir alî bibe pêşiyê hemberî li wê zordariyê disekine û xwe diparêze.

Bi hemû hêza xwe ve hewl dide ku kesayetî û derûniya wî xirab nebe û xwe ji wê zilmê rizgar bike.

Berî ku bêhêz bikeve bi hêviya azadî û rizgarbûnê bi ser xwe disekine û rê nade zordar li wî hikm bike, berxwedana wî bişkêne.



Bes heger li ser wî zordarî û cerdkirin(mobbîng) zêde bibe, heger bê bîr û bawerî, bê rêbaz û bê hivî be, pê de pê de hêza wî ya hemberî zordaran dişkê, taqeta wî ya berxwedanê namîne.

Kurt û kurtasî tam jî di vê qonaxê de bi neçarî beden, hêst û hişê xwe radestî zordaran dike.

Bi demê re kesayetiya wî xirab, xwegiramiya wî ji holê radibe. Nîşanên sendromê hêdî û hêdî dest pê dikin. Nîşanên li vê sendromê yên sereke jî ev in:

- Qurbanî bi çavên zilmkaran ve li xwe dinêrin û xwe sûcdar dikin, piçûk dibînin.
- Heq didin zilmkaran, hevxemiya wan dikin.
- Reddî zilma ku hatiye serê wan dikin.
- Şikiandina zilmkaran dikin.
- Di dawiyê de xwe aîdî nasyonala serweran dikin.

Niha bêhtir di Bakûrê Kurdistanê de ew rewşa ku me li jorê qal kiriye mixabin rû daye.

di nav Kurdên Bakûrê Kurdistanê de hêvîşkestinek heye, ji ber wê li gorî demên berê zêdetir xwe nêzikî kûjerên dapîr û bapirên xwe dikin. xweyî komara Tirkan, rêber û rêxistinên wan derdikevin.

Jinên femînîst bi sekûlerîzma komarê ve xwe aîdî pergala serweran dikin. Kurdên zaravayê kirkdkî axêv, xweyî baweriya ehlî heq xwe ne kurd, li ser baweriyê bisilmaniyê wek 'Elewî' pênase dikin.

Di nav wan de "em ne kurd in, zaza û elewî ne" jî mixabin zêde bûye. Herweha li pey hizra "Demokratîzebûna pergala dewletê" ketine. Ji xwe re kirine armanca sereke.

Damezrînerê komarê, pergala dewletê wek rizgarkerên xwe dibînin, pê şikiriya xwe tînin.

Kurmancî û kirdkî ne tenê di jiyana rojane de, li malên wan de jî kêmtir tê axavtin.

Ji dûrî neteweya xwe, esl û neslên xwe ne. Esl û neslên xwe paşvero dibînin. Xwe bi çand û zimanê tirkan ve modern hîs dikin. Hebûnên xwe piçûk dibînin. Her dem di nav pirsgirekên hebûnê de dijîn. Çiqasî ji kesayetiya xwe, ji bingeha hebûna xwe dûr dikevin, ewqas di nakokiyên hebûnê de dijîn.

Ne li vir in, ne li wir in. Di Arafê de ne...Her çiqas ji dûrî kurdbûnê bin ewqas pesna pergala komarê, bîr baweriyên serweran didin. Rojên taybet ên nasyonala Tirkan her carê bi dengekî bilind pîroz dikin, nijadiya wan dikin.

Lê xwe bikin qurbana serweran jî ser-

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjeya bidarvekirinan li heyva Xezelwerê ji 131 haletan derbas bû



Rêjîma Îranê ji destpêka heyva Xezelwerê ve heta 27ê heyvê, zêdetir ji 131 kes li girtîgehên xwe li seranserê Îranê de êidam kirine û li girtîgeha agahî li Melekanê de jî kesek li jêr îşkenceyan de kuşt.
Sibîdeha roja 27ê Xezelwerê, "Rehîm Feqîrî", kurê Sebrî", xelkê gundê Sêwederê ser bi devera Şipîran a bajarê Selmasê û "Perwîz Berahûyî", xelkê bajarê Zahidane û girtiyekî din ku nasnama wî nehatiye zanîn li girtîgeha rêjîmê li bajarê Bîrcendê de hatine bidarvekirin.
Herwisa li vê rojê de girtiyek ê bi navê "Ferec Sermedî" yê temen 32 salî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Zencanê û Mistefa Molayî li girtîgeha navendî ya rêjîmê li bajarê Xuremabadê de hatiye bidarvekirin.
Li sibêdeha roja 26ê Xezelwerê de jî, Mehdî Gîlanî li girtîgeha Lakan a rêjîmê li bajarê Reştê û "Secad Keremî" yê temen 31 salî, li girtîgeha rêjîmê li bajarê Îsfehanê de hatine bidarvekirin.
Rêjîma Îranê ji 1 heta 27ê Xezelwerê, zêdetir ji 131 kes li girtîgehên xwe li seranserê Îranê de bidar vekirine.
Herwisa rêjîma Îranê bi encamdana cinayeteke hovaneya din, kesek ê bi navê "Xefar Ekberî", xelkê Melekanê ser bi bajarê Meraxê li girtîgeha îdareya agahî ya rêjîmê li bajarê Melekanê de bi qasekî îşkence kirûbûn ku piştî veguhastin bo girtîgeha rêjîmê li bajarê Meraxê bi sedema wan îşkenceyan canê xwe ji dest daye.

## Rêjîma Îranê sizaya bidarvekirin bi ser kesên li dosyeya bi navê "Beçêhayê Êkbatan"ê de sepand




Rêjîma Îranê sizayê bidarvekirinê bi ser 6 kesan ên li dosyeya "beçêhay Êkbatan"ê de bi tohmeta kuştina bizanebûn a besîcekî rêjîmê, sepand.

"Babek Pakniya", yê parêzerekî dosyeya bi navê "Beçêhayê Êkbatan"ê li roja Çarşemî 23ê Xezelwerê de belav kir ku bi biryara şêwirkarê taya 13 a dadgeha sizakirin a rêjîmê li bajarê Têhranê de bi ser wan 6 kesên li vê dosyê de bi tohmeta kuştina bi zanebûna besîcekî rêjîmê hatine dadgehîkirinê, sizaya bidarvekirinê hatiye sepandin.

Li 4ê Xezelwera 1401 a Rojî de besîcekî rêjîmê yê bi navê "Arman Elîvêrdî" li dema serkutkirina xelkê medenî de li pêvajoya tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê de hate kuştin û rêjîma Îranê zêdetir ji 50 kes ji xelkê şehreka Êkbatanê binçav kirin û li nav wan kesan de "Mîlad Armûn, Elîriza Kefayî, Emîrmihemd Xuş Iqbal, Newîd Necaran, Husên Nêimetî û Elîriza Bermerzpûrnak" ji aliyê rêjîmê ve wek tohmetbarên bingehîn ên vê dosyê hatine dadgehîkirin, lê wan kesan jî bi berdewamî ew tohmeta rêjîmê red kiriye.

## Îsal zêdetir ji 13 zarokên xwendevanan xwe kuştine



Xwekujiya zarokan bi taybet xwendekaran bi sedema givaşên li xwendigehê û herwisa reftarên tundûtij ji aliyê berpirsên xwendingehan û hêzên ewlehî yên rêjîmê, zêdetir bûne.
Pêka amarên belavbûyî, ji destpêka îsal ve heta 22ê Xezelwerê, zêdetir ji 16 zarokên xwendevan, hewla xwekujiyê daye ku 13 kes ji wan canê xwe ji dest dane, tirsa zarokên xwendevan ji malbatên xwe û givaşên rêjîmê û hejarî sedemê dest birin bo xwekujiyê ne.
Piştî şoreşa "Jin Jiyan Azadî"yê û rola bingehîn a xwendekar û xwendevana bi taybet keçên xwendevan, givaşên ewlehî yên rêjîma Îranê bi rêya "encumena îslamî" û besîca xwendingehan, beşa perewerdeya îslamî û beşa heraset anku ewlehiya rêjîmê li xwendingehan, rewşeke metirsîdar û aloz bo xwendevanan çêkiriye û li reftara wan digel xwendevanan de , kerb, kîn, tundûtîjî, bêrêzîkirin û tohmetlêdan li asteke serberedayî de tê dîtin, ku sedemên girîng a xwekujiya zarokên xwendevan in.
Herwisa hejmarek ji keçên xwendevan ku li girtîgehên rêjîmê de hatine îşkencekirin, piştî azadkirinê hewla xwekujiyê dane û rêjîmê jî gelek caran hewl daye ku kuştina ciwanan bi xwekujiyê ve girê bide.

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (482)




## YA KU HÛN QET NIKARIN
## kuştina azadiyê ye, di rih û canê me de

**Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê**
Navenda Ragihandinê